

# Tabloya Peryodîk û Element

## Proton

Madeya ku ji heman cureyê atoman pêk tê, jê re element tê gotin. Hejmara protonên di tovika atomê de cûreyê elementan destnîşan dike. Her elementek bi semboleke taybet tê nivîsandin. Her sembolek bi tîpekê yan du tîpan e. Ev şêwaz li tevaya cîhanê wek hev e. Hin mînakên ku sembolên elementan diyar dikin ev in: Oksîjen (O), Hîdrojen (H), Zêr (Au) û Zîv (Ag).

## Tabloya Peryodîk

		Gruppenummer																	
		1	2	3	4	5	6	7	8	9	10	11	12	13	14	15	16	17	18
Periodennummer	1	1 H Hydrogen																	2 He Helium
	2	3 Li Lithium	4 Be Beryllium											5 B Bor	6 C Karbon	7 N Nitrogen	8 O Oksygen	9 F Fluor	10 Ne Neon
	3	11 Na Natrium	12 Mg Magnesium											13 Al Aluminium	14 Si Silîcium	15 P Fosfor	16 S Sivorel	17 Cl Klor	18 Ar Argon
	4	19 K Kalium	20 Ca Kalsium	21 Sc Scandium	22 Ti Titan	23 V Vanadium	24 Cr Krom	25 Mn Mangan	26 Fe Jern	27 Co Kobolt	28 Ni Nîkel	29 Cu Kobber	30 Zn Sink	31 Ga Gallium	32 Ge Germanium	33 As Arsen	34 Se Selen	35 Br Brom	36 Kr Krypton
	5	37 Rb Rubidium	38 Sr Strontium	39 Y Yttrium	40 Zr Zirkon	41 Nb Niob	42 Mo Molybden	43 Tc Technetium	44 Ru Ruthenium	45 Rh Rhodium	46 Pd Palladium	47 Ag Solv	48 Cd Kadmium	49 In Indium	50 Sn Tin	51 Sb Antimon	52 Te Tellur	53 I Jod	54 Xe Xenon
	6	55 Cs Cesium	56 Ba Barium	•	72 Hf Hafnium	73 Ta Tantal	74 W Wolfram	75 Re Rhenium	76 Os Osmium	77 Ir Iridium	78 Pt Platina	79 Au Gull	80 Hg Kvikkölv	81 Tl Thallium	82 Pb Bly	83 Bi Vismut	84 Po Polonium	85 At Astat	86 Rn Radon
	7	87 Fr Francium	88 Ra Radium	••	104 Rf Rutherfordium	105 Db Dubnium	106 Sg Seaborgium	107 Bh Bohrium	108 Hs Hassium	109 Mt Meitnerium	110 Ds Darmstadtium	111 Rg Roentgenium	112 Uub Ununbium	113 Uut Ununtrium	114 Uuq Ununquadium	115 Uup Ununpentium	116 Uuh Ununhexium		
		57 La Lantan	58 Ce Cesium	59 Pr Praseodym	60 Nd Neodym	61 Pm Prometium	62 Sm Samarium	63 Eu Europium	64 Gd Gadolinium	65 Tb Terbium	66 Dy Dysprosium	67 Ho Holmium	68 Er Erbium	69 Tm Thulium	70 Yb Ytterbium	71 Lu Lutetium			
		89 Ac Actinium	90 Th Thorium	91 Pa Protactinium	92 U Uran	93 Np Neptunium	94 Pu Plutonium	95 Am Americium	96 Cm Curium	97 Bk Berkelium	98 Cf Californium	99 Es Einsteinium	100 Fm Fermium	101 Md Mendelevium	102 No Nobelium	103 Lr Lawrencium			

Tevaya elementan di tabloya peryodîk de hatine organîzekirin. Her elementek di tabloya peryodîk de li gor hejmara protonên di tovîkê de hatiye numarekirin.

Ji ber ku di tovîka elementa hîdrojenê de protonek tenê heye, ew elementa yekê ye.

Di tovîka elementa Oksîjenê de 8 proton hene, ji ber vê yekê numera wê heşt e . Rêzên asoyî di tabloya peryodîk de, wekî “periyod” tên nasîn.

Di her peryodekê de ji çepê ber bi rastê ve, hejmara protonên di tovîkê de û elektronên di rêgeha derve de bi yekê (libekê) zede dibin. Elementên ku di heman stûnê de ne, wek “kom” tîna nasîn. Tevaya elementên heman komê hejmara elektronên di rêgeha wan ya derve de wek hev e.

## Kanza (Metal)

Kanza li aliyê çepê ji tabloya peryodîk in. Ji bilî elementa cîva (Hg) ya ku di pileya germahiya odeyê de di rewşa ron de ye, hemû kanzayên din hişk in. Li aliyê rastê ji tabloya peryodîk, em dikarin elementên nekanza bibînin. Hejmarek elementên nekanza, wek mînak hîdrojen û hîlyom, gaz in. Elementên li sînorê di nav kanza û nekanza de, heye ku taybetmendiyên wan ên kanzayî û nekanzayî jî hebin. Ev cureyê elementan bi “mînakanza” tîna binavkirin.

## Gazên Nirxedar

Elementên di koma 18’an de, wek “gazên nirxedar” tîna binavkirin. Ev gaz pir stabîl in, anku ew reaksiyonê ne bi hev re û ne bi elementên din re nakin. Sedem ew e ku tevaya gazên nirxedar rêgeha wan a derve dagirtî ye, lewra ew ji bo dagirtina rêgehên xwe ên derve nehewcedarên elementin din in.

Navê elementên di koma 1’em de (ji bilî hîdrojenê) kanzayên tiftî (bazî) ye. Pirêna caran ev element reaksiyonê bi elementên din re dikin, ji ber ku tenê elektronek di rêgeha kanzayên tiftî ya derve de heye. Elementên ku rêgehên wan ên derve hewcedariya wan bi elektronên zêdetir heye, reaksiyonê bi kanzayên tiftî re dikin da rêgehên xwe ên derve bi elektronan dagirin.

## Rahênan li ser tabloya peryodîk û elementan

**Valahiyan bi peyvên gunav ên li jêr dagire, da ku hevok serrast bibin.**

kom, element, proton, tabloya peryodîk, peryod, tovik

Madeya ku ji heman cureyê atoman pêk tê jê re \_\_\_\_\_ tê gotin. vHejmara \_\_\_\_\_ ên di tovika atomê de cureya elementan destnîşan dike. Element di sîstemeke bi navê \_\_\_\_\_ tê nasîn de organîzekirîne. Li gor vê sîstemê hemû element li gor hejmara protonên di \_\_\_\_\_ ê de hatine numarekirin. Di tabloya peryodîk de rêzên asoyî bi navê \_\_\_\_\_, û stûn bi navê \_\_\_\_\_ têne nasîn.

**Bersiva rast hilbijêre, (heye ku zêdî bersivekê rast hebe).**

- Elementên sereke yê ku em li rexê çepê ji tabloya peryodîk dibînin çine?
  - Gazên nirxedar
  - Kanza
  
- Şeweyê cîva di germahiya odeyê de çawa ye?
  - Gaz e
  - Hişk e
  - Ron e
  
- Taybetmendiyan gazên nirxedar çine?
  - Bêhna wan xweş e.
  - Ne stabîl in.
  - Stabîl in
  - Reaksyonê bi elementên din re nakin.
  
- Taybetmendiyan kanzayen tiftî (baz) çawane?
  - Stabîl in û reaksiyonê bi elementên din re nakin.
  - Elektronek tenê di rêgeha wan a derve de heye.
  - Gelek caran reaksiyonê bi elementan re dikin.